Ji bo
Jiyanek nû

Xûşk û birayên ezîz!

Wekî hûn jî rojevê dişopînin, îroj him cîhan, him herêm û him jî welatê me yê bindest di bin pêlên şerê olî de ne. Ji aliyekî jinên gelê me yê Êzidî mîna mîhan li bazaran têne firotan, li nava Farisan ji ber bawerî û netewa xwe xortên me têne dardakirin û kuştin. Li ser wînc û amûrên din bi dehan Kurdên me têne kuştin!

Gelê me, wekî dilxwaz, aştîxwaz û baweriya yek xwedayî, tim zerduştî bûn. Ew hînkariyek bû, bi xwe ne ol bû. Heta ku ol ketin welatê me; tu kes ji ber olan nehatibûn kuştin, dardakirin an jî firotan.

Divê hûn bizanibin, bi olan xelasî tim bi xebatê, bi nekirina xeletiyan, bi dilnizmiyê bi dayînê û bicih anîna şert û mercên wê olê pêk tê. Belê, divê tu bide, bixebite, biperiste, çewtiyê olê, qirêjiya olê li nezanîbûna xwe bar bike û bi vî awayî, ew jî dibe ku, bigihêje xelasiyê.

Ya Gelê Kurd!

Divê em bi qencî bizanibin ku mêtîngeran bi hezaran sal e, olê ji xwe re kirine hesp û me jî xistine bin barê olê, ew pêş ve diçin, tahde û xebat ji gelê min re dimîne. Divê em bi dilekî pak, bi biryareke vebirî bêjin: "ÊDÎ BES E!" Divê hûn biryar bidin; mîna ku Mûsa ji gelê xwe re got, em jî ji we re dibêjin: **"Ez îroj erd û ezmanan li dijî we şahde digirim ku jiyan û mirinê û bereket û naletê danîme ber te; ji bo vê yekê jiyanê hilbijêre, da ku, bona ji Xwedayê xwe XUDAN hez bike, gotina wî guhdarî bike û bona ku pê re girêdayî bimîne tu û nîjada te bila bijîn; ji ber ku jiyana te û dirêjiya rojên te ew e; da ku, tu li welatê ku XUDAN bona bide bapîrên te, ji Birahîm, Îshaq û Aqûp re, bona ku bide wan sondê dayiye, rûnê."** (5. Mûsa 3:19,20)

Belê, xûşk û birayên delal; divê ku hêza me ya guhertinê tunebe, lê bawer bikin mafê me yê li dij sekinînê her tim heye. Em li dijî çewtiyan, neyariyê, xeletiyê nebaşiyê, dîlitiyê, kuştinê, tahde û zordestiyê bisekinin! Dilê me pak, nêta me pak

be, em ê bi ser bikevin, em ê azadî û aştiya rasteqîn bijîn. Em dizanin hûn jî mîna me aşiqê aştî û azadiya rasteqîn in. Ji ber vê yekê guh bidin banga Mesîh, ku dibêje: **“Hûn ê bi rastiyê bizanibin û rastî dê we azad bike! Ji bo vê yekê, ger Îsa Mesîh we azad bike, hûn bi rastî azad dibin.”** (Yûhena 8:32 û 36)

Lê ka çawa?

Xwedê bi rêya peymanan têkiliyê bi mirovan re datîne. Peymana pêşîn (Kevin) bi rêya Deh Emirên li ser kevir hatin nivîsandin hate çêkirin. Mirovan di nava sedsalan de gellek carî wan emiran borandin. Divê Xwedê mirovên ku vê gunehê kirine biceza bikirana lê, ***“ji ber ku Xwedê ew qasî ji dinê hez-kir ku, Berxê xwe yê yekane da. Da ku, bila tu yên baweriyê bi Wî bînin mehw nebin, lê gişt bigihêjin jiyana abadîn!”***

Yûhena 1:1 dibêje ku: **“Berê Gotin hebû û Gotin bi Xwedê re bû”**... Gotin kete bedenê, daket rûyê erdê û bû Berxê ku bibe qurbana gunehên me.

Belê, xûşk û birayên xoşewîst, gelê me li pêy Med û Midyan, bindest ket, her tim janê kêşand, hate qîr kirin, bona olan bû xulam. Xelasî bi ola nîne; mîna ku Quran dibêje: **"Ji we tu kes nîne ku neçe dojehê. Ev daraziyek di asta Xudan de teqez hatiye girtin e"** (Meryem, 19/71).

Belê, di olan de tu her çi bike dîsa jî para te dojeha bi jan û êş û ezab e. Ez li dijî hemî kevneşopî, kevneperestî û olan im. Lê bawer nakim ku ez gunehkarek bim. Ez dikarim angaşteya "Ez xelas bûme" bikim. Belê, ez tenê bi bawerîanîna Mesîh Îsa, ji gunehên xwe xelas bûm, ji nû ve welidîm û bûm mirovek nû.

Ji ber ku Îsa Mesîh li Golgotayê, ser xaçê, bi bêgunehbûna xwe hemî gunehê dinê hilda, ji bo mirovan bû qurban û bi xwîna xwe ya bêguneh û pîroz, cara duyem Peymana di navbera Xwedê û mirovan de pêk anî.

Kes bi karên xwe yên qenc û olan xelas nabe ya xûşk û birayên ezîz, lê belê bi bawerîanîna Îsa Mesîh em dikarin ji jiyana xwe ya kevin û gunehên xwe xelas bibin û bigihêjin jiyana abadîn!

Îsayê Pîroz vexwendiyê li we jî dike, ku bona hûn bi Wî ewle bibin û gotinên Wî qebûl bikin û bi vî awayî xelas bibin û bigihêjin jiyaneke nû û dewlemend. Ew dikare hêza Ruhê Pîroz bide we û ruhê we, canê we û bedena we paqij bike. Dilên xwe ji ber olan tund mekin, qencî ji bexşandin û hêza Îsa Mesîh ve bibînin û ji xezeba Xwedê ya ku dê were xelas bibin. Îsa, yê ku we bi fidyê xelas dike yî, Xelaskerê we, yê ku bona we di duaya ji Xwedê re navgîniyê dike, yê ku bona we ji Xwedê re navgîniyê dike yî. Ew jiyana we yî û misogeriya ewlehiya bêdawîn ya we dike. Bona ku hûn ji tijîbûna Wî xêrê li ser xêrê bigirin, de ka, niha bi destê Wî yê ku dirêjî we dibe bigirin!

Ger hûn jî bixwazin digel me bi bawerî anîna Îsa Mesîh ve xelas bibin, ji kerema xwe tevî me dua bikin:

"Ya Îsa Mesîhê Xelaskerê min, Tu Xelaskerê dinê yî û Xelaskerê min e jî. Te bi xêra xwe min ji xezeba Xwedê ve xelas kir. Te min ji gunehên min, janên min, kêmasiyên min, min xelas kirin. Bona Yê ku Xerab e li ser min nebe xwedî hêz jiya-

neke pak û rastiyek ezmanî bide min. Min mîna şopînerekî xwe qebûl bike û bona têgihîştina min ya hînkarî û destûrên te, min ronî bike. Bona ez û gelê min Xwedayê Pîroz di jiyana xwe de bilindtir bikin, bila hêza Te di lawaziya me de hebe. Bona gelê min yê hustîxwar aştî û azadiya rasteqîn bîne. Amîn."

Gelo hûn dixwazin di derbarê Îsa Mesîhê Xelaskerê Dinê de bi zêdeyî hînî agahiyan bibin?

Ger hûn ji me re binivîsînin û bixwazin ku em ji we re bişînin, em amade ne ku Mizgîniya Mesîh, tevî nivîsên ku daxuyaniyê dikin û alîkariyê dikin ku hûn li ser bifikirin, bê berdêl ji we re bişînin.

Navnîşana me ev e
Hoffnung und Leben e.V.
Postfach 10 13 82
33513 Bielefeld | Germany
Incilkurd@web.de
www.hoffnung-leben.info

Kurdisch (Für ein neues Leben)